

## Salvegera wefata Seyda Cegerxwîn (1984-1903)

Helbestvanê mezin ê Kurd Cegerxwîn 41 sal berê koça dawî kir. Kurdên li çaraliyê cîhanê her sal di 22ê Cotmehê de ji bo Cegerxwîn bîranînan li dar dixin. Mezinahiya wî her ku diçe bêtir tê famkirin, û pirtûkên wî îro jî di nav ciwanan de, mîna duh.......

Dom»R:10






## Peyama Desteya Kargêrî ya PDKÎ bo 7 mîn kongireya Yekîtiya Xwendekaran

Berî her tiştekî, bi hilkefta lidarxistina kongire ya rêkxirava ve, em pîrozbahiyê li we dikin û hivîdar in kongire ya ve bi serkevtiyane bi rê ve here û bernameyên vê bigihîjin encamê.Her wek li armancên giştî yên rêkxirava ve de hatiye, Yekîtiya Xwendekarên Dêmokrat a Kurdistanê, wek hewcehiyek girîng a siyasî û rêkxiraveyî bi armanca rêkxistina qata xwendekarê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê û bo hejmarek armancên......

Dom» R:2

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (**504**)23-10-2025 Buha (1000) Tûmen*



## Şerê Çaldiranê û Peymana Amasyayê (1514)

Wek tê zanîn Peymana Amasyayê di 1514an da çêbûye. Ev peyman di navbera Padîşahê Osmanî Yavuz Sultan Selîm û derdora 25 Rêvebirên Kurd da pêk hatiye. Bêguman mîmarê rêvebirên civata Kurdî jibo wê peymanê, Îdrîs-î Bidlîsî (1452-1520) ye. Lê pêwist e ku mirov şertên berîya wê peymanê û Şerê Çaldiranê bîne ber çav û bi kurtayî be jî rewşa wê demê derxe meydanê. Di wê çarçoveyê da rewşa civata Kurdî yên Sunî û Elewî jî divê li ber çav were girtin.

Dom» R:5

# Mirovê şoreşvan, xwedî baverekî qahîm e



Hin caran di pêvajoya xebatê de rewşekî nexwastî û dijwar tê pêş ku heya qasekî bê hivîtî bi dû xwe de tîne û dibe sedema nîgeranî û dilequtkê hem bo xelkê û hem bo parek ji xebatkaran jî.

Xebatkar û mirovên şoreşvan ên kurd ku di pêxema bidestveanîna maf û azadiya netewî û qedera xwe de rêya xebatê hilbijartine, bê guman bi agahî û zanebûn ve bûne şoreşvan, ger kesek jî ku bi agehî û zanebûn rêbazek girtibe bera xwe bi bawer û îman bi berheqiya vê rêbazê ye ku amade ye ked û îza û nirxê li vê rêk de jî bide.

Ku wisaye berî heçî kesê mirovê şoreşvan ku xwedî baver û îrada berxwedanê ye, nabe tu carî li qonaxên dijwar ên xebatê de bê hivî be û bikeve dilequtkê.

Mirovê şoreşvan ê Kurd ku xebatê dike bona bidestveanîna mafê netewî, ku bi pêşmergê Kurdistanê tê naskirin, bona geheştina bi armancên bilinde xebatê ku armancên netewîn e, amade ye ku mezintirîn sermayê jiyana xwe an ko canê xwe jî li vê pêxemê de gorî bike. Ger xelkê asayî baş ji vê pirsê tênegîje û tenê bona xoşvaniya pêşmerge û berdewamiya xebatê li qonaxên dijwar de nîgeran dibe, dîsan ewa pêşmerge û şoreşvan in dibe îrade bexş bin û xelkê ji nîgeranî û bêhivtiyê derxînin.

Şoreş û xebata gelê me bi dirêjahiya dîrokê evraz û nişîvên cuda cuda bi xwe ve dîtine, gelek caran kevtiye, lê gelek nekêşaye dîsan rabûye, gelek caran serkevtinên mezin û şanazî bo gelê xwe tomar kirine, mirovê şoreşvan ne li dema şikestê de bê hivî debe, ne dema serkevtinê de serxwe diçe.

Ger em basê xebata netewî li Rojhilatê Kurdistanê bikin, ev 8 dehike ku bi pêşengî û rêberiya Hizba Demokrat ev xebat berdewam bûye û ger hin caran kevtiye, lê aliyê kêm tu caran nehêlaye ku dujmin bigehe xwezya xwe ku bo hertim şoreş û dengê rizgarîxwaziya Kurd mat bibe. Ceribandina xebata gelê kurd û berxwedaniya heya îro rojê ku hatiye kirin, bo me ev wane û derseye ku em erxayînin ji vê yekê ku her çavan me gelek roj û qonaxên dijvar bohorandine, dê îro rojê jî her wisa serbilind bi derbasbûn ji vê qonaxa dijvar, bi xebat û berxwedanî û pêşengiya xwe bibe cihê şanaziya gelê xwe û xwediyê hemen pêgeh û hitbar û xoşvaniya xwe bin û çi hêz û aliyek û deshilat û dewletek û dujminek nikare rolê pêşengatiya Hizba Demokrat li Îran û kurdistanê de berçav negire.



## Pan-Turkîzm: Kirîza Nasnameyî an proksiya dewleta nawendî?

Dom » R:3




## Neteweperestiya Kurd, diyardeyek şermezar an jî pêwîstiyek dîrokîye?

Dom » R:6

# Peyama Desteya Kargêrî ya Hizba Dêmokrat bo 7 mîn kongireya Yekîtiya Xwendekarên Dêmokrat a Kurdistanê

**Rêzdaran, beşdarbûyên 7 mîn kongire ya Yekîtiya Xwendekarên Dêmokrat a Kurdistanê!**

Berî her tiştekî, bi hilkefta lidarxistina kongire ya rêkxirava ve, em pîrozbahiyê li we dikin û hivîdar in kongire ya ve bi serkevtiyane bi rê ve here û bernameyên vê bigihîjin encamê.

Her wek li armancên giştî yên rêkxirava ve de hatiye, Yekîtiya Xwendekarên Dêmokrat a Kurdistanê, wek hewcehiyek girîng a siyasî û rêkxiraveyî bi armanca rêkxistina qata xwendekarê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê û bo hejmarek armancên bilind ên netewî û xwedî nirx pêk hatiye.

Bê şik û guman, rêkxistin û bi rêkxistinkirina hêz û sermayê mirovî ya xwendekarên Kurd, erkek pîroz û berpirsatiyek dîrokî ye.

Rêkxistina hêz û şiyana pengurî ya qata xwendekarê Kurd tevî hebûna bername û wêjmanek hevpar û bernameya birojkirî û demdirêj a rêkxiraveyî û piştre girêdana vê bi tevgera netewî û dêmokratîk a Rojhilatê Kurdistanê, erkî û berpirsayetiya we, girantir û binirxtir dike.

**Xwendekarên xebatkar!**

Kongireya we li rewşeke nû û tejî guherînên deverî û navnetewî de bi rê ve diçe, Bi taybet ku cografiyaya siyasî ya Îranê wek pêkhatiyek çendî netewî û çendîn civakî, piştî serhîldan a tevgera "Jîna" yê ve bi durûşma "Jin Jiyan Azadî", qonaxeke nû ya rikeberî û xebat û xweragirî bi dijî xoserî û dîktatoriya rêjîma komara îslamiya Îranê, dicerîbîne. Qonaxek ku çîn û qat heçîkîjan pêka pêgeh, şiyan û karlêkeriya xwe, têde rol dilîzin.

Şik û guman li vê yekê de nîne ku li vê navbendê de rola pêşengiya jinan, ciwanan û xwendekaran, berçavtir e.

lewma çavrêtî tê kirin ku kongireya we bi lêkdan û hûrbîniyê, şiroveyek çendîn alî bo rewşa ku amaje pê hatî kirin û herwisa rewşa tevgera xwendekarî li Îran û Kurdistanê û bi giştî pêvajoya wan guherînan bike ku jîngeha siyasî û civakî û rewşa hizri ya vê qonaxa nû xistine jêr bandor û karlêkeriya xwe.



Ev yeka jî girêdayî bi hebîna hişmendiyekî rastbîn û hevdem şirovekirinek rexnegirane li derheq karûbarên rêkxiravî ya Yekîtiya we û girêdana vê bi çarçoveya bingehîn ya kar û çalakiyên ve li Rojhilatê Kurdistan û Îranê de heye.

Li tevgera netewî û rizgarîxwazane ya Rojhilatê Kurdistanê û bi taybet li dîroka Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê de doz û bandor û tekoşîna xwendekarên Kurd bûye nerîtek xwedî nirx û cihgirtî û dîroka tevgerê selimînerê vê rastiyê ye.

Bi tenê wek mînak, rola şoreşvanên wek şehîd Simayîl Şerîfzade û Ebdula Muînî li tevgera çekdaraneya salên 46-47 û herwisa rêberên şehîd ên wek Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî, dîroka fidakarî û cangorîkirina hejmarek zaf ji akademîsiyen û xwendkarên berdewam û şoreşvanên Kurdistana me tîne bîra mirov.

Wan têkoşeran li pêgeha akademîkî û zanîngehan, bi zanist û zanîn û ceribandinên xwe, hatine nav tevgerê û tevlî xebata pêşmergane û jiyana rêkxiravî bûn û bi hemû şiyana xwe ji tevger û armancên vê yên bilind xwedî derketin û li rastiyê de bûne remza man û berdewamiya xebat û tekoşîn li pêxema Kurd û Kurdistan û mafên netewiyên me.

**Beşdarên rêzdar ên 7 mîn kongireya Yekîtiya Xwendekaran!**

Gelek girîng e ku Yekîtiya Xwendekarên Dêmokrat a Kurdistanê li pesendkirin û pêspartinan û hilsengandinan de pêdagirî bi ser xwerêkxistinkirinê bike û bi dîtingehek nû û pêka şiyana xwe û derfetan, rêkxistin û tekoşînê bo xwe wêne bike û bîne berçavên xwe û bi têgihîştinek rast bi dîtingehek Kurdistanî û netewî û rêzgirtin ji cudatiyên hizrî û siyasiyan, bi lixwegirtina xwendekaran, nûneratiya beşek ji xebat û pirsa rewa ya netewa me bike.

Bi balkêşandin bi ser vê rastiyê tevî ku derfetak bo çalakiya siyasî û warê karê rêkxistin li Îrana bindestê desthilata komara îslamî de nîne, lê li Kurdistanê de asta xwest û daxwaziyên xwendekarên Kurd li zanîngehan bi berhevdanîn digel dehikên derbasbûyî, zêde bûye û xwestên wan bi berhevdanîn digel beşên din ên Îranê, tundajotir û netewîtir in.

ev yeka îşareyek bi hêza geşekirina hişmendiya netewî û rizgarîxwazaneya li nav qata xwendevan û xwendekarên Kurd e.

Li vê rewşa nû de civaka medenî ya Kurdistanê bi hemû hêz û aliyên xwe, netenê xwe li çarçoveya dîrokî û li rêbaza siyasî û hizriyên netewî yên Kurdistanê cuda nekiriye, belku hevpêywendî û hevxebatiya xwe qahîmtir û bihêztir kiriye.

Lewma ji aliyekê erk û ji aliyê din ve berpirsayetiya hemû aliyan girantir bûye û Yekîtiya xwendekaran jî dibe bi hestiyarî mêzeyî wan pirsan bike. Niha em li qonaxekê de ne ku mil bi milê jin û ciwanan û qatên din, çalakvanên xwendekarî rênîşanderê giştî ne û li zanîngehan de bûne dengê bivêr û nîşanderê xwest û daxwaziyên netewî.

Tevî wan îşarekirinên dilxweşker, serkevtin li wî warî de hewcehî bi hêzek meydanî û xwedî bername heye ku bikare wize û hizra xwendekarên Kurd wek darayiyek netewî û civakî, kom bike û rêkxistin bike.

Bo bidestveanîna vê armancê, hewce ye ku hizra siyasî û zanistê tevlî karê meydaniya siyasî û rêkxiraveyî bê kirin û bêguman, rêkxiravên medenî pêka surûşt û hejmarek taybetmendiyên xwe, dikare li vê pêxemê de alîkar û bi bandor be.

Li dawiyê de li derheq birêveçona serkevtiyane ya 7 mîn kongireya rêkxirava ve, em pîrozbahiyê li hemû beşdarên kongirê û endamên têkoşerên rêkxirava we û beşdarbûyên kongirê û endamên têkoşer ên rêkxirava we dikin û hêviya serkevtinê bo we dixwazin.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Desteya Kargêrî**

**Çiriya Pêşîn**

# Pan-Turkîzm: Kirîza Nasnameyî an proksiya dewleta nawendî?



N. Dr. Mecîd Heqî

Li bajarê Urmiyê, yek ji krîzên nasnameya neteweyî yên herî tevlihev û herî kêm tê dîtin di nav erdnîgariya siyasî ya Îranê de, di çarçoveya diyardeyek neteweperestî de bi navê Pan-Turkîzm diqewime, îdeolojiyek ku li ser serdestiya etnîkî ya Tirkî û xwesteka yekîtîyê di navbera neteweyên Tirkîaxêv de ye, lê li vê herêmê ew xwe bi şiklê dijminatiya vekirî li dijî gelê Kurd nîşan daye. Nimûneya wê di slogan, gef û gotarên tundûtûjî de di qada giştî û virtual de tê dîtin.

Analîzên dîrokî nîşan dide ku axa Urmiyê bi sedsalan e beşek ji erdnîgariya dîrokî ya Kurdistanê ye, çavkaniyên wekî Yaqut-e-Shamui, Ibn-e-Hawqal, û Hamdullah Mostofi niştecihên sereke yên vê herêmê wekî Kurdên ku wekî “Mukerî” û “Hekarî” têne zanîn, destnîşan kirine. Her weha, heta sedsala 17-an, raporên mîsyonerên Fransî Urmiyê wekî “Kurdistana Jêrîn” bi nav dikirin.

Hatina Tirkan bo herêmê bi giranî di sedsala 11an de bi dagirkirina Selçûkiyan dest pê kir, û di serdema Sefewî û Qacaran de, pêkhateya demografîk a bakurê rojavayê Îranê, tevî Urmiyê, guherî. Di vê serdemê de, polîtîkayên hikûmetê, di nav de veguhestina eşîrên Tirkîaxêv ji Qefqasya û Anatoliyê, û her weha sepandina kontrolên olî û polîsî li deverên sînor, hebûna Tirkî xurt kir.

Di serdema Pehlewî de, siyaseta “yekîtiya neteweyî” ya ziman û nasnameyê zext li ser nasnameyên ne-Farisî - di nav de Kurd û Tirk - kir û bû sedema pêşbaziyek ji bo xwedîtiya dîrokî û nasnameyê ya herêmê. Ev pêşbazî niha veguheriye pevçûnek avahîsazî di navbera Tirk û Kurdan de li Urmiyê û Neqedayê.

#### Fonksiyonên Civakî û Siyasî yên Pan-Turkîzmê

Li bajarekî wekî Urmiyê, ku pêkhateya wê ya etnîkî pirreng û pirqatî ye, avahiya desthilatdariyê bi dîrokî di destê komeke Tirkên Şîe de kom bûye, komeke ku saziyên siyasî, îdarî û ewlehiyê yên herêmî kontrol dike. Di salên dawî de, mezinbûna hişmendiyê û berfirehbûna beşdariya siyasî û civakî di nav nifûsa Kurd de ji hêla vê çîna serdest ve wekî gefek li ser statuya wan a damezrandî, mîna apartheidê, hatiye dîtin. Di çarçoveyek wisa de, îdeolojiya Pan-Turkîzmê dibe amûrek ji bo ji nû ve hilberandina nasname û rewatiyê, nasnameyek ku ji hêla çanda serdest ve tê pejirandin û soz dide ku statuya civakî ya alîgirên xwe biparêze an jî zêde bike.

Destpêka vê pêvajoyê dema ku hestên şerm an neheqiya dîrokî vediguherin dijminatiyê li hember komên cîran çêdibe. Li Urmiyê, Kurd wekî “yekî din ê xeternak” têne xuyang kirin, komek ku divê were kontrol kirin da ku tiştê ku Tirk jê re dibêjin “yekparçeyiya Azerbaycanê” were parastin. Di qada sîber de, gotinên wekî “paqijkirin”, “cîhada etnîkî” û “vegera Hesenî” bûne gelemperî, mînakek tundûtûjiya sembolîk ku sînorên dijminane bi rêya axaftinê ava dike.

Pan-Turkîzm li vê herêmê ne tenê tevgereke gelêrî ye, lê beşek ji stratejiya kontrolkirina hikûmeta navendî ye. Hikûmetên Îranê ji serdema Pehlewî bigire heta Komara Îslamî her tim nakokiyên etnîkî wekî amûrek desthilatdariyê bi kar anîne. Mînakî, di dema Komara Kurdistanê (1946) de, artêşa Îranê bi hevrêziya hêzên Tirk ên Naqedeh û Urmiyê li dijî gelê Kurd mudaxele kir.

Di dehsalên dawî de, li şûna tepeserkirina rasterast, rêbaza “hiştina tundûtûjiyê” ji bo hêzên tundrew ên etnîkî hatiye bikar anîn, Ango hikûmeta navendî, bi afirandin an tehemûlkirina herikînên tundrew, wan bi bandor wekî leverek bikar tîne da ku tevgerên neteweyî yên Kurd û Tirk kontrol bike. Ev jî ew tişt e ku Edward Said jê re got “kolonyalîzma navxweyî”, ango, komên kêmneteweyên etnîkî li şûna ku dijminatiya xwe li ser navendê bikin, li dijî hev dizivirin.

#### Gefên Niha û Dubarekirina Gotara Nefretê

Bi berfirehbûna torên civakî re, tevgerên pan-Turkî yên tundrew karîne



toreke nefretê li dijî Kurdan organîze bikin: gefên qirkirinê, rûmetdayîna kesayetiyên wekî Mela Hesenî, û çandina çîroka “Kurd koçber in û Tirk xwecih ne” çandin. Ev çîrok, tevî înkarkirina delîlên arkeolojîk û çavkaniyên dîrokî, zû di hişê raya giştî de kok digire û hevgirtina di navbera neteweyan de ji holê radike.

Wekî din, piştgiriya medyayî û îdeolojîk ji bo tevgerên pan-Turkî ji hin torên li Tirkiye û Komara Azerbaycanê hatiye dîtin. Ev faktor dibe sedem ku gotara pan-Turkî li Îranê û Rojhelata Kurdistanê bikeve orbîteke jeostratejîk. Ji aliyekî din ve, hevgirtina vê tevgerê bi siyaseta hikûmeta Îranê re bûye sedema birêvebirina cihêrengiyê bi rêya dijminatiyê, ango berdewamiya kontrola siyasî bi parastina dabeşbûnên etnîkî.

#### Bijardeya Gelê Kurd: Hevjiyana Pirneteweyî û Planek ji bo Sibê

Her çend rewşa heyî tevlihev be jî, rêya derketina ji vê bêçalakiyê eşkere ye: ne ji nû ve afirandina neteweperestiya hevbeş, lê afirandina avahiyên pirneteweyî yên demokratîk. Welatên wekî Swîsre û Belçîka mînakên vê rêyê ne:

- Li Swîsreyê, federalîzma zimanî û çandî hevjiyana berfireh di navbera axêverên Almanî, Fransî, Îtalî û Romanşî de pêk aniye.
- Li Belçîkayê, dabeşkirina desthilatdariyê di navbera Flamanî û Valonîyan de li ser bingeha wekheviya neteweyî û zimanî hatiye sazûmankirin.

Gelên Kurd û Tirk divê ji bo guhertinên jêrîn di erdnîgariya siyasî ya Îranê de hewl bidin:

**1.** Federalîzma Pirneteweyî: Naskirina fermî ya neteweyên Kurd, Tirk, Belûçî, Ereb û Faris di destûrê de û garantîkirina xweseriya siyasî û çandî ji bo herêman.

**2.** Perwerdehiya pirzimanî û dîroka pirdeng: Ji nû ve nivîsandina pirtûkên dersê û dîrokên neteweyî li ser bingeha cihêrengiya çandî û dîrokî ya rastîn.

**3.** Saziyên navçandî ji bo çareserkirina nakokiyên etnîkî: Avakirina diyaloga etnîkî û encumenên edaletê bi nûnerên hemî netewe û etnîsîteyan.


Di çarçoveyek wisa de, têgeha “Îraneke pirneteweyî” dê şûna vegotina yek-etnîkî bigire, û tevgerên tundrew ên wekî Pan-Turkîzm dê axa xwe ya civakî winda bikin. Gelên Tirk û Kurd, ku bi sedan salan li kêleka hev jiyane û çarenûsên wan bi hev ve girêdayî ye, dikarin ji bo pêşerojek wekhev, azad û demokratîk bi hev re bixebitin.

Pan-Turkîzm li Urmiyê ne tenê îdeolojiyek neteweperest e, lê di heman demê de hilberînerek krîza nasnameyê di nav axaftvanên Tirkî de ye û hêzek wekîl e ku xizmetê ji polîtîkayên hikûmeta navendî re dike. Rêya derketina ji vê rewşê ne tepeserkirina bêtir e, lê ji nû ve avakirina avahiyên siyasî ye ku cihêrengiyê ne wekî gef, lê wekî potansiyel dibînin. Îrana me ya sibê dikare bibe welatek ku Tirk û Kurd, Faris û Belûç, Ereb û yên din li kêleka hev bijîn, ne wekî dijmin, lê wekî hevkar di rê de.

# Rêçare, bihevrejiyan e, yan rikeberî?



N. Serbest Urmiye



Parêzgeh û bajarê Urmiye, weke bajareke sitratejîk di erdnigariya siyasî û neteweyî ya Rojhilatê Kurdistanê de, şûnewareke dewlemend a dîrokî ye ku hilgirê pareke herî berîn û bi nirix ji çand û dîroka neteweyî ya Kurdistanê ye. Bajararê Urmiyê bi paşxaneke bihêz a dîrokî ya bi hezar salan, hevdem ku di Îrana destçêkirî de xwedî pêgeheke şaristaniyê bûye, hertim navendeke sitratejîk a berxwedana siyasî, çandî û neteweyî ya gelê Kurd jî li dijî sîstem û siyasetên bişavtin û jiholêrakirina nasnameya neteweyî bûye.

Di wê rewşê de jî di siyaset û ragihandina fermî ya dagîrkeran de bi xurtî û fermî hewil hatiye û tê dayîn ku ji nasnameya Kurdi were valakirin. Ji ber vê çendê û bi merema qutkirina têkiliyên çandî, neteweyî, dîrokî û zimanî yên vî bajarî bi herêma Kurdistanê re, di çarçoveyeke derewîn a bi nave "Azerbaycana Rojava" de ji nû ve hatiye pênasekirin.

Piştî serhildana pêvajoya avakirina dewlet _ netewe ya hemdemî di Îranê û nemaze di dema desthilatdariya Reza Şah'ê Pehlewî de, siyasetek micid ji bo guhertina demografî û çanda Urmiyê hate destpêkirin. Akincîkirina koçerên ne xwecih di herêmê de, guhertina navên Kurdî yên gund û herêmên derdor û qedexekirina zimanê Kurdî ji pergala perwerdehiyê, beşek ji vê pêvajoyê bûn.

Di Komara Îslamî de jî, ev siyaset ne tenê nehatin sekinandin, belkû di çeperê ol û ewlehiyê de hatin xurtkirin. Siyaseta ku ewlehî girîngtir ji nasnameyê dida şopandin, Urmiyê ji bajarekî Kurdî yê pir reng ji çand û hebûnê ve, veguherî herêma krîz û qeyranan ku tê de pir rengiya neteweyî û çandî, yê bûye emrazê hevrikî û xwe sepandina siyasî. Rasîzm anku nijadperestiya hişmend û pîlandarêtî bi eşkere li Urmiyê di rewşeke aloz de derbas dibe. Ji aliyekî ve, hikûmeta navendî, di bin siya gotara "ummeta Îslamî" û "yekîtiya neteweyî(Îranî)", de behsa wekheviyê dike, lê di kiriyar de, hemû navendên desthilat, sîstema perwerdehî û medyayê - di ber destên wan hevrikan de ne ku armanca wan a sereke nehêştina bingehên çandî û civakî yên Kurdan e.

Ji aliyê din ve, pêvajoya netewexwaziya tundajû ya pan-Turkîzmê ku bi piştîvaniya eşkere û nepenî ya navendên cur bi cur yên desthilata dagîrker a navendi bi xasmanî navendên ewlehiyê de, heta tê xurttir dibe, hertim di hewla înkarkirina dîrok û nasnameya Kurdî û sepandina nasnameyek nû de ye li ser Urmiyê.

Di rewşeke wiha de, Urmiye bûye bajareke parçekirî: ji aliyekê ve, gelê Kurd ku rehên wan di ax, avadan û çanda vî bajarî ve girêdayî ne, ji aliyê din ve jî, taqimên tunadjû ku bi piştîvaniya dewlet, media û perwerdeyê, hewil didin kok û binetarên Kurdî li ser vê axê rakin û bi valakirina vî bajarî ji nasnameya Kurdî, gelê Kurd jê havî bikin. Encama parçekirinê bi vî rengî jî tenê rêyê li ber bi hevrejiyan û dadperweriyê asteng û dijvar dike û dibe hegera serhildna hevrikiyê di navbera civak û çandên cuda yên herêmê de.

Nasnameya Kurdî ya Urmiyê di navbera du hêzên dijber û hev armanc de Bizava parastina nasnameya Kurdî ya bajarê Urmiyê li hember êrîşên du hevrik û dijberan, lê tevavkerê hev de berxwe dide: nijadperestiya hişmend a navendparêz û netewexweziya ne xwecih û tundajû ya herêmî. Ya yekem di dilê desthilata fermî û pêkhateya dewletê de diherike; heman sîstema ku di bin navê "yekîtiya neteweyî(Îranî)" de, hemû nasnameyên neteweyî yên ne-Faris înkar dike.

Di pêkhateya han de, ziman û çanda Kurdî ne weke semyana neteweyî, belkû wekî gef li ser ewlehiya dewleta navendî tê pênasekirin. Perwerdehiya bi zimanê dayîkê di Xwendingehan de qedexe ye û medya û ragihandin di bin siyaseta sansora dewletî de rê nadin zinamê Kurdî nûneratiya nasnameya neteweyî bike. Armanca vê nijadperestiya binçîneyî jî ku zal bûye bi ser hemû aliyên perwerde, medya, aborî û siyasetê de, tenê ji holêrakirina nasnameya Kurdî ye li Urmiyê.

Ji aliyekî din ve, netewexweziya tundajû ya neteweya ne xwecih di bin navê pan-Turkîzmê di herêmê de, bi gotar û dîrokeke sexte hewl dide ku gelê Kurd wekî "biyanî" li ser axa xwe bide zanîn. Bizava han bi piştevaniya dezgehên ewlehiyê yên dewleta dagîrker a navendî tev digere û bi hemû terzan di hewla nehêştina nasnameya Kurdî di herêmê de dide.

Bi kurtî her du hêzên han serbarê dijberiya hev, di paqijkirina herêmê ji gelê Kurd û nasnameya neteweyî ya Kurdî de hevgirtî û hev armanc in. Lewma di rewşeke wiha de, tekezkirin û berxwedan ji bo parastina nasnameya Kurdî ya Urmiyê ne hesteke derûnî, belkû di asteke herî bilind de pêdiviyeke dîrokî ye. Pêdiviyek ji bo parastina hizir, ziman û rûmeta mirovên ku Urmiyê weke perçeyekê ji erdnîgariya neteweyî, siyasî, çandî û dîrokî ya Kurdistanê dibînin.

**Parastina Nasnameya Kurdî ya Urmiyê, parastina dadperwerî mafeke dîrokî ye**

Nabe ji bizava parastina nasnameya Kurdî ya Urmiyê weke bizaveke çandî were mêzekirin. Ji ber ku tevgereke siyasî û dîrokî ye ji bo vegerandina dadperwerî û mafê çarenivîsa xwediyên resen ên şûnewarekê ku bi dehan salan e ji birêvebriya xwecêhî û desthilatê hatine dûrxistin. Bizava han di astekî herî bilind de, ji sînorên parastina çand û ziman derbas dibe û dibe bizavek ji bo ji nû ve xwendina dîroka berxwedana gelê Kurd li hember dagîrkeran.

Parastina nasnameya Kurdî ya Urmiyê, bizaveke tevalî ye ji bo vegerandina rûmet, hizir û mafê çarenivîsê. Tevgerek e ji bo dabîn bûna dadperweriyê û parastina hevsengiyê di navbera neteweyên herêmê de. Urmiye dikare bibe sembola vê tevgerê li seranserê Kurdistanê. Bajarek ku brîndarê siyasetên bişavtin û guherîna şûnasê ye, divê îro bibe navenda berxwedanê li dijî hemû bizavên dagîrkirinê.

# Şerê Çaldiranê û Peymana Amasyayê (1514)



N. Sidîq Bozerselan

**Têkilîyên Kurd û Osmanîyan û Kurd û Safewîyan**

Wek tê zanîn Peymana Amasyayê di 1514an da çêbûye. Ev peyman di navbera Padîşahê Osmanî Yavuz Sultan Selîm û derdora 25 Rêvebirên Kurd da pêk hatîye. Bêguman mîmarê rêvebirên civata Kurdî jibo wê peymanê, Îdrîs-î Bidlîsî (1452-1520) ye. Lê pêwist e ku mirov şertên berîya wê peymanê û Şerê Çaldiranê bîne ber çav û bi kurtayî be jî rewşa wê demê derxe meydanê. Di wê çarçoveyê da rewşa civata Kurdî yên Sunî û Elewî jî divê li ber çav were girtin. Eger em rewşa wê demê ya hundur û derve jibo civata Kurdî nedin zanîn û zelal nekin, mirov nikare nirxandineke îlmî çêke.

Divê em bidin xuyakirin ku tevayîya sedsala 15.an jibo beg û eşîrên Kurdan, sedsaleka ne baş bûye û bi gelek zehmetîyan derbas bûye. Ji ber ku rêvebirên (beg-eşîr) Kurd di nava agirên "Akkoyunî û Karakoyunîyan" Kavrê reş û Kavrê sipî da mane ku ew herdu Baskên Turkmenan bûne û li dijî hev şer kirine. Di wan şeran da jî yên herî zêde xisarmend bûne, Kurd bi xwe bûne. Di 1403yan da Akkoyunîyan herêma Dîyarbekrê zept kirine û Dîyarbekir ji xwe ra kirine serbajar (paytext). Di dawîya 1460an da Uzun Hasan, zorbirîya Karakoyunîyan dike û Tebrîzê bi dest dixe. Bi vî awayî Akkoyunî dibin serdestê (hakimê) Kurdistanê.

Îcar em piçek behsa Safewîyan jî bikin. Tarîqeta Safewîyan, di dawîya sedsala 13. an da li Erdebîlê saz bûye ku ev der, di bakurê Îranê ya îroyîn da ye. Di 1440an da tarîqet di nava turkmenên Akkoyunîyan da dest bi rêxistinîyê dike û Şîatîyê belav dike. Serekê tarîqetê Şah Îsmaîl, di 1501ê da Tebrîzê zebt dike, dawî li Dewleta Akkoyunîyan tîne û dewleta xwe ava dike. Avabûna Dewleta Safewî, jibo turkmenên Îranî jî dibe navendeke cazîbeyê, loma Safewî ber bi rojava ve belav dibin. Bi vî awayî xîmê Şerê Çaldiranê derdikeve meydanê, ji ber wê ye ku pêşveçûnên Safewîyan jibo Osmanîyan êdî bûye xeter.

Di wê rewşê da jibo Osmanîyan, rawestandina Safewîyan bi saya serê tifaq û hevkarîya Kurdan mimkun dibe ku herêma Kurd wek tampon were bikaranîn. Bê guman rêvebirên Osmanîyan fikirîne ku bi rîya tifaq û hevkarîya Kurdan, hem Kurd dê bibin dîwareke qeîm li dijî Îranê û hem jî dê têkilîyên Safewîyan û begên turkmenên Anatolyayê ji hev werin birîn.

Ew tifaq û hevkarîya ku Osmanîyan difikirîn, jibo rêvebirên Kurdan jî dibe firsetek ku bi Osmanîyan ra tifaqan çêkin. Ji ber ku eşîrên Kurdan ji hev belawela bûne û nikaribûne bi îradeyên xwe yên azad werin ba hev û tifaq û hevkarîyan çêkin. Felsefeya "Ez ezî"yê ya giregirên Kurd, li pêşîya wan adeta bûye astengeka esasî ku di nav xwe da tifaqan çêkin.

Piştê îlankirina Dewleta Safewîyan, derdora 11 Begên Kurd diçin huzûra Şah Îsmaîl ku wî pîroz bikin. Balkêş e ku Şah Îsmaîl wan rêvebirên Kurd davêje zindanê û di şûna wan da zilamên ku sadiqê îradeya wî ne, tîne ser kar. Li hemberî wê politika Ş. Îsmaîl, Sultan Selîm jî ji rêvebirên Kurd ra bi awayek sozên otonomîyê tîne cî. Di wê politikayê da hedefa hewildanên Şah Îsmaîl ew in ku Mezhebê Şîatîyê bi metodên zorê bi Kurdên Sunî bide qebûlkirin. Li dijî wê politikayê, ji Yavuz Sultan Selîmê Sunî ra jî dibe firset ku Kurdên Sunî jî di bin rêvebirîya Osmanîyan da werin ba hev û li dijî Îranê bibin dîwarek.

Çarçoveya jorîn ku min bi kurtî da zanîn; hîmên çêkirina Peymana Amasyayê hatîye meydanê. Tê gotin ku Peymana Amasyayê di navbera Padîşahê Osmanîyan Yavuz Sultan Selîm û 25 Begên Kurdî da çêbûye ku mîmarê wê lihevhatinê jî Îdrîs-î Bidlîsî ye. Lê xuya dibe ku di Şerê Çaldiranê da 15 rêvebirên Kurd digel hêzên xwe yên çekdar beşdarî kirine û bi saya wê piştgirîyê, Osmanî bi ser ketine. Mirov dikare bêje ku hêzên Kurd di vî şerî da pêşevatîyê / pêşengîyê kirine û loma Osmanî bi serketin e.



**Hukmên wê peymanê weha ne:**

**1–** Osmanî, dê parastina otonomiya Begên Kurdî biparêze; rêvebirîya Begên Kurdî dê ji babê derbasî lawî bibe û bi fermana padîşah bibe qethî.

**2–** Di hemî şeran da dê Kurd digel Osmanîyan cî bigrin û Osmanî jî dê li dijî êrîşên derve Kurdan biparêzin.

**3–** Begên Kurdan dê bacê (wêrgu) bidin Osmanîyan ku ew miktar, Osmanî didin kifşkirin.

Piştî pêkanîna Peymana Amasyayê, Îdrîs-î Bidlîsî, Begên Kurdan tek u tek zîyaret dike, ji wan dixwaze ku dezgah û heyîyên Safewîyan hemî werin ruxandin û paqijkirin. Bi vî awayî bingehê peymanê fireh dibe û ew begên ku ji alîyê îdareya Safewîyan ve hatibûn dûrxistin, careka dî dizivirin ser erdên xwe û cîyên xwe yên rêvebirîyê distînin. Bi wî awayî ji sînorên Maku, Musul û heta Baxdayê zencîreke Kurdî pêk tê ku di wê çarçoveyê da hemî Kurd digel hêzên Osmanî di Şerê Çaldiranê da cîyê xwe distînin. Ev rewş, heta Peymana Qesra Şîrîn didome ku di 1639an da çêdibe û dibe sînorên Osmanî û Îranê û her weha Kurdistan jî di navbera wan her du dewletan da cara ewil dibe du perçe.

Balkêş e ku piştî Şerê Çaldiranê, Y. S. Selîm berpirsîyarî dide Î. Bidlîsî ku digel Begên Kurdan biaxife da ku ji xwe ra bi navê "Begêbegan ê Kurdistanê" (Kürdistan Beylerbeyi) serekek hilbijêrin. Mixabin ku Begên Kurdan nikarin di nava xwe da lihevhatinek çêkin ku yekî ji xwe ra bikin serok. Bi tabîreka dî, ji ber "ez-ezîyê" begên Kurdan nikarin yekî ji xwe ra bikin serek an berpirsîyar ku em li jêr vê rastîyê ji devê Î. Bidlîsî dibîsin; loma ew rewşa wan a hundurî ye ku ew bûne mehkûmê Osmanîyan ku bi wan ra lihevhatinek çêkin. Felsefeya ku Îdrîs-î Bidlîsî jî birîye wê merheleyê, ev şola "ez-ezîyê" ya giregirên Kurd bixwe ye.

Di pêvajoya Şerên sînorî yên Dewletên Osman û Safewîyan ku bo hukumkirina Kafkasyayê, Azerbaycanê, Kurdistanê û Îraqê pêk hatine wek 1514-1516, 1534-1556, 1587-1628, 1636-38,1724-32; piranîya mîrên Kurdan beşdarî kirine û digel Osmanîyan cî sitandine. Di pêvajoya Şerê Çaldiranê da Mîrên Kurdan, Îdrîs-î Bidlîsî rêdikin cem Sultan Selîmê I. da ku ji rêvebirîya xwe berpirsîyarekî wek Begêbegan hilbijêre jibo Kurdistanê ku ew Karaxanî ji Kurdistanê biqewitîne. Li ser wê daxwaza Îdrîs-î Bidlîsî jibo Y. S. Selîmê I., ji Îdrîs-î Bidlîsî dipirse da ku ji nav mîrên Kurdan ew kê hilbijêre bo wî karî, Bersiva Îdîrs-î Bidlîsî weha ye:

´Tevayîya wan jî hema hema wek hev in û tu kes ji wan li pêşberî yekî dî naxwaze xwe bitewîne (xwar bike). Jibo têkoşîneka digel hev û bi tesîr li hemberî Qizilbaşan (Elewîyan), pêwist e ku selahîyet jibo xebatkarekî Sarayê were tayînkirin da ku di nav ahengeke da mîrên Kurdan jê ra îtaatê bikin." (4) Sultan Selîm wê berpirsîyarîyê ewil dide Îdrîs-î Bidlîsî û paşê jî wî karî dide Mehmed Paşayê Bisimbêl (Bıyıklı Mehmet Paşa).

# Neteweperestiya Kurd, diyardeyek şermezar an jî pêwîstiyek dîrokîye?



N. Odyssey
W. Hesen Mukerem




Ev gotar ne tenê weke hestek subjektîf, lê weke îdeolojiyekê jî li ser neteweperweriya Kurdî disekine û argumanên wê rave dike.

Neteweperwerî, weke tevgerek civakî û siyasî, komek pêkhateyan dihewîne ku dibin alîkar ku nasnameyek neteweyî çêbibe û hesta aîdiyeta bi neteweyekê re xurt bibe.

**Hin ji pêkhateyên herî girîng ên neteweperweriyê ev in:**

**1.** Nasnameya Neteweyî: Netewperwerî li ser naskirin û pênasekirina nasnameyeke neteweyî ye.

Ev nasname bi gelemperî ziman, çand, dîrok û adetên hevpar dihewîne.

**2.** Xweserî an Serxwebûn: Neteweperestî ji bo neteweyan xweserî û serxwebûna siyasî dixwaze. Ev pêkhate bi taybetî di civakên di bin serdestî an kolonyalîzmê de girîng e.

Di forma xwe ya herî bingehîn de, ev daxwaza mafê çarenûsî ji bo revîna ji serdestiya yên din û bidestxistina serweriya neteweyî bi awayê serxwebûn an xwerêveberiyê vedihewîne.

**3.** Yekîtiya Neteweyî: Netewperwerî hewl dide ku mirovên cihêreng ên neteweyekê li dora hevpariyên neteweyî bîne cem hev û hesta yekîtî û hevgirtinê pêş bixe.

Ev armanc hem ji bo civakên bi dewletên neteweyî û hem jî ji bo civakên di bin serdestiyê de derbas dibe, ya yekem ji bo parastina hevgirtinê, ya duyem jî ji bo afirandina hevgirtinê.

**4.** Parastina çand û mîrata neteweyî: Neteweperestî girîngiyê dide parastin û pêşvebirina çand, ziman û mîrata dîrokî ya neteweyê û hewl dide ku van hêmayan ji gefên derveyî biparêze. Ev pêkhate di civakên bê dewletên neteweyî de, ku hêmayên nasnameya wan di bin gef û sînordarkirinê de ne, hîn girîngtir e.

**5.** Hestê Aîdiyetê: Ev tevger dibe alîkar ku hestek kûr a aîdiyetê bi ax û neteweyê re biafirîne, ku dikare bibe sedema dilsozî û pabendbûna bi welatê heyî re an jî xwesteka bidestxistina serweriyê.

Bi hev re, van pêkhateyan neteweperweriyê weke hêzek ajotinê di dîroka hemdem û pêşketinên siyasî û civakî de pêk anîne.Lê neteweperwerî di çarçoveya "netewe" de tê şekildan.

**Pêkhateyên neteweyekê komek hêmanên sereke dihewînin ku dibin alîkar ku neteweyek şekil bidin û pênase bikin. Ev pêkhate ev in:**

**1.**Nasnameya çandî: Ziman, adet, huner û kevneşopiyên hevpar ên ku mirovên neteweyekê bi hev ve girêdidin.

**2.** Dîroka hevpar: Ezmûnên dîrokî, di nav de serkeftin, têkçûn û xalên werçerxê, ku dibin alîkar ku hestek nasname û yekîtiya neteweyî çêbibe.

**3.** Erd: Xaka taybetî ya ku neteweyek lê dijî û aîdî wê ye. Ev hêmana erdnîgarî di nasnameya neteweyî de roleke girîng dilîze.

**4.** Dewlet û sîstema siyasî: Hebûna dewletek serbixwe ku nûnertiya berjewendiyên neteweyê bike û maf û azadiyên welatiyan garantî bike.

Mercek din jî xwestek û meyla kûr a afirandina dewlet û sîstema siyasî ye, her çend defacto û xweser be jî, û hewldanek çalak ji bo bidestxistina wê di civakên ku niha ew tune ne. Ev xwestek sînorê di navbera eşîr û neteweyê de di civakên bê dewlet de ye.

**5.** Hestê Hevgirtinê: Hestê hevgirtinê û hevkariyê di navbera endamên neteweyê de ku civatek yekgirtî û aram diafirîne.Ev pêkhate bi hev re nasnameyek neteweyî ava dikin û dibin alîkar ku neteweyek hevgirtî û aram çêbibe. Hemû ev pêkhate di civaka Kurdî de hene.

Ti îdeolojiyên din, çi olî bin çi sosyalîst bin, û di vê gavê de, xwedî potansiyeleke ewqas berfireh nînin ku hêmayên nasnameyê yên neteweya Kurd biparêzin an jî alîkariya bidestxistina mafê serweriya neteweyî bikin.

Ji ber vê yekê, divê hemî elît û sempatîzanên neteweya Kurd, bêyî ku meyla wan a îdeolojîk çi be, li dora vê hêmana hevpar her hewldanekê bikin da ku pêşî li tunekirin û qirkirina spî ya vê neteweya kevnar bigirin.



## Nerîna



**"Mesûd Barzanî":**

**"Divê hikûmeta nû ya Herêma Kurdistanê beriya hilbijartinên Parlamentoya Îraqê bê avakirinin."**



**Îlham Ehmed:**

**"Entegrasyona HSDyê dê bibe gaveke girîng bo Sûriyeyê ."**



**"Marco Rubio":**

**"Divê Heşdî Şebî demildest bê çek bibe."**



**"Fuad Husên" :**

**"Eger Kurd dabeş bin, dê li Bexdayê miameleya bi wan re cuda be"**

# Dibe ku Îran bibe xwediya 10 bombeyên etomê!



**N. Eskender Ceiferî**

Ajansa Navdewletî ya Wizeya Etomê ragihand bi santrîfyûjên ku rêjîma Îranê hene, dive ku ev rêjîm di demeke nêz de bibe xwediya 10 bombeyên Etomê.

Hevdem Îsmaîl Beqayî berdevkê Wezareta Derve ya rêjîma Îranê da xuyakirin ku ewê tenê wê demê rê bidin çalakî û pişkinînên Ajansê, ku Ajans ji Amêrîka û Troyîka Ewropî dûr bikeve û di bin bandora wan de nebe.

Piştî ku dîsa Donald Trump vedigeriya ser desthilata Amêrîkayê û bi Îsraîlê re êrîşî ser cihên etomî yên Îranê kir, lê niha dîsa xuya dibe ku Îran hêj bombeyê dixwaze. Trump Niha dîsa gefên xwe li ser Îranê zêde dike, lê rêjîma Îranê di destwerdanên xwe de li navçeyê berdewam e.

Dema ku rêjîma Îranê hajekên xwe yên balêstîk dane Hûsiyan û wan jî bi wan hajekan êrîşî ser cihên sivîlan li Îsraîlê kir, dîsa derket holê ku rêjîma Îranê dixwaze bombeya Etomê çê bike.
Ev xuya dike, heke rêjîma Îranê bi hajekên balêstîk êrîşî ser Îsraîlê dike, dibe ku ev rêjîm ji bo çêkirina bombeya Etom jî her tiştî bike da ku aloziyên zêdetir li navçeyê çê bike.

Ev jî di demekê de ye ku rêjîma Beşar Esed, mezintirîn dîktatorê ku ji aliyê rêjîma Îranê ve dihat piştevanîkirin, hate rûxandin, Hemas lawaz bû, Hizbulla bêbandor bû, Heşda Şeibî bê hêz bû, Îran zêdetirî berê nîgeran e.

Heman hajekên ku niha Hûsî davêjin Îsraîlê, di destepêka şoreşa Jînayê de rêjîma Tehranê bi wan hajekan, êrîşî ser baregehên partiyên Kurd dikir û di encamê de bi dehan sivîlan şehîd bibûn.
Ev jî di demekê de bû ku rêjîma Îranê careke din îdia dikir ku ew bombeyê naxwazin û wê piştî heyameke din,



careke din Danûstandinên Etomî dest pê bikin.

Di dema desthilatdariya Îbrahîm Reyîsî de, Husên Emîrebdulahiyan wezîrê derve yê rêjîma Tehranê ragihand ku êdî rêkeftina Etomî ji aliyê wan ve nakeve ber bas.

Ev jî di demekê de bû ku welatên Brîtanya, Feranse û Almanyayê ragihandibûn ku ji bo nîşandana niyazpakiya xwe, reşnivîsa li dijî Îranê nadin Ajansa Navdewletî ya Etomê.

Lê niha piştî êrîşa Hûsiyan ji bo ser Îsraîlê bi hajekên Îranê, derdikeve holê ku rêjîm dixwaze fitneyê li deverê berfireh bike.Beriya niha piştî êrîşa ser Kela Dêmokrat û partiyên din jî dîsa metirsiyên vê rêjîmê xuya bibûn.

Wê demê hejmarek ji parlamenterên Almanî ragihandibûn ku "me li vir li parlamentoya Almanya gotûbêj û nirxandina mijaran dikir û hevdem jî rêjîma Îranê bi dronan êrîşî ser cihên sivîlan li herêma autonomî ya Kurdistana Îraqê kir.

Pêwîstiya Ewropayê bi stratêjiyeke nû li hemberî Îranê heye. Ev gelek sal in ku li Îranê binpêkariyên berfireh ên mafên mirovan çê dibin û lewma em nabe li ser mijara rêkeftina Etomî biaxivin."

Piştî ku rêjîmê got ew dîsa rêkeftinê dixwazin, Donald Trump serokkomarê berê yê Dewletên Yekbûyî yên Amêrîkayê dewsa xwe da Joe Biden û dihat pêşbînîkirin ku dewleta Biden vegere ser gotûbêjan ji bo rêkeftina Etomî bi Îranê re.

Dewleta Biden nekarî Îranê razî bike ku nabe bibe xwediya bombeya Etomî. Niha jî dîsa Donald Trump vegeriya ye ser desthilatê û lewma rêjîma Îranê zêdetir ditirse. Ev rêjîm dixwaze zûtir bombeya xwe çê bike da ku metirsiyên xwe ji bo ser navçe û cîhanê zêdetir bike.

Îsraîl jî bi Amerîkayê re hevnerîn e û dibêje nabe Îran bibe xwediya bombeya etomê.

Rêjîma Îranê jî bersiva berpirsên Îsraîlî û Amerîkî dabû û gotibû: "Wê cîhan wan gunehbariyên ku rayedarên Îsraîlê dikin, ji bîr neke." Piştî ku Donald Trump rêkeftina Etomî ya bi Îranê re bi tundî rexne kir, Rex Tillerson wezîrê Derve yê Amêrîkayê jî xwest rêkeftina Etomî ya bi Îranê re were guherandin û jinûve were nivîsandin lê ji bo razîkirina Îranê ew li benda piştgirîya hevalbendên xwe yên Ewrupî ne.

Tillerson got ku xalên rêkeftinê têra xwe tund nîn in û rê li ber planên Etomî yên rêjîma Îranê nagirin.

Wê demê Sergey Lavrov Wezîrê Derve yê Rûsyayê ku ji bo Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî li New Yorka Amêrîkayê bû, li ser helwêsta Amêrîkayê ya di mijara Îranê de dabû xuyakirin ku helwêsta nelihevkirinê ya Donald Trump serokkomarê Amêrîkayê cihê fikarê ye.

Feranse, Brîtanya û Alman difikirin ku heke Îrana Etomî bikeve Rojhilata Navîn, ewê pêgeha xwe ji dest bidin.

# Hevpeyvîna Agirî digel Rojnamevan Resûl Geleban



Resûl Geleban

Hevpeyvînkar: Sîmîn Rûhanîzade



**1. Tu rewişa civakî û siyasî ya bajarên ku Kurd û Azerî bihevre dijîn yek, ji wan bajarê Urmiyê di heyama wan çend salên dawî de çawa dibînî?**

**Bersiv -** Em dizanin ku Urmiye bi taybetî di deh salên derbasbûyî de yek ji wan bajarên çend êtinîkî yan çend netewî bûye ku hestiyariyek zêde têde hatiye dîtin, bo rohinkirina vê yekê ku em bizanin bo rewiş wisa lêhatiye dive li destpêkê de em bizanin ka kîjan êtinîk li Urmiyê dijîn û ji kengî ve rewiş wisa lêhatiye.

Li Urmiyê de du neteweyên sereke hene Kurd û Azerî ku belkî yek ji wan, rêjeyan wan kêmtir ya zêdetir be, lê her du neteweyên serekene, û du kêm neteweyên Ermenî û Aşûrî jî li wî bajarî de dijîn, ya din ku gelek girînge û dive wek piraktîkek em bizanin û vê yekê qebûl bikin ku Urmiye mezintîrîn bajarê Efşarnişîne, Efşar kêne?

Efşar ev Azeriyên resenin yên eşîra Efşarin ku piştî şerê Dim Dimê, Sefeviyan koçberî wê navçeyê kirin û dever radestî wan kirin, yanî rêjeya herî zêde ya Azeriyên Urmiyê Efşarin û hindek Azerî hene ku tenê zimanê wan Azerî ye û li esila xwe de ewane Kurd bûne, lê bi sedema vê yekê ku Efşar di vê demê de zal bûne bi ser xelkê din de karîne ziman, çanid û kultûra wan biguherin û wan asimîle bikin, heta beriya Şoreşa Gelan li Îranê ku Hesenî dever xiste bin destê xwe de, pêywendiyên civakî yên di navbera Kurd û Azeriyan de zêde aştîxwazane bûye, û pêywendiyên malbatî hebûne û bi gişitî pêywendiya wan ya civakî gelek bihêz û teba bûye, weke mînak kesên destfiroş ku piraniya wan Azerî bûn û gund bi gund digeriyan zimanê Kurdî fêr bibûn û bi Kurdî diaxivtin, yan jî Kurd ger serdana bazaran kiriban li hin cihên ku hewice ba bi Azerî diaxivîn, û eva tîştek gelek asayî bû wê demê, lê piştî ku Hesenî deselat girite dest xwe, gelek Kurd hatine tohmetbarkirin, hatine girtin û kuştin û heta sala 1394an a rojî, helbijardina mecilisa dehem çalakiyên Kurdî li Urmiyê gelek zêde bûn, û bi sedema wan çalakiyan hişiyariya siyasî jî zêde bû, êdî Kurdan ev zilim qebûl nekirin û ev du alîtî zêde bû, û piştî hingê Urmiye rastî ev hestiyariya zêde bûye û ez baverim karbidestên navendî li Têhranê vê yekê baş dizanin, û yek ji siyaseta wan eve ku ev kêbirkêya dinavbera Kurd û Azeriyan de berdewam be û ev mifaha xwe jê werdigirin, û min got ku Kurd hişiyariya wan zêde bû , û ev du alîtiye çê bû, ku sê sedemên sereke hene, yek eva bû ku hêz û çavkaniya aborî yên deverê di destê Azeriyan de bû bi taybetî Azeriyên girêdayî bi Tewrêzê û biriyar ji aliyê wan dihate dan û li Urmiyê dihat cîbicîkirin, lê Kurdan ev yek qebûl nekir.

Sedema duyê hişiyariya siyasî ya di nava Kurdan de li deverê zêde bû, çalakiyên çandî zêdebûn, dema ku çalakiyên çandî zêdebûn Azerî jî xwe hesiyan û xwe tirisiyan ev tirise di nava Azeriyan de çê bû, yanî ku bi rohinî bêjim Azerî ji hişiyariya siyasiya Kurdan tirisiya.

Sedema sêyê siyasetên ewlehî yên komara Îslamî ye ku her şêwe çalakiyên medenî û çandî yên Kurdî bi nerênî û eminî dibîne, bi taybetî di Urmiyê de ev raportên ku berpirs û karbidestên Panturik di şandin bo Tehranê, bandorek zêde li ser rewşê hebû, û ev sê sedemên ku me bas kirinî bûne hegera têkçûna bihevre jiyana Kurd û Azeriyan ku heta şoreşa sala 1357an bihevre jiyana, wan ti kêşe û astengî nebûn, ez vê yekê jî zêde bikim ku rewiş heta heftiya derbasbûyî belkû li rû de xwe aram nîşan dabe, lê ev layên jêrîn kêbirkêyek li ser nasiname û pêgeha civakî hebû ku di deh salên derbasbûyî de zêde bûye.

piştî leyîza topanên ya tîmên weke Hoor sport û Rûnahî taboyek hate şikandin û piştî sed salan nave Sikmo bi eşkere li cihek giştî de hat gazîkirin û ev tirisa ku hertim hebû, ev tiris nema û ev kesên ku ev nave gazî dikirin bi şanazî gazî dikirin, lê di niha de rewşa civakî û siyasî bi wî avayî diçe û xuya nine ka eva baş e ya xirab, ev maye ser organîzekirina me Kurdan yanî gelek girînge ku em vê tiştê organize bikin yan ne.

**2. Bi nêrîna te çima piştî her serkevtinekê û her keyfxweşiyekê ji aliyê Kurdan ve, tundrev pê nerihet dibin û bertekên tund ji xwe nîşan didin?**

**Bersiv -** Ez baverim 3 sedem hene, yek her weke ku min li pirisa serî de jî amaje pêkir ku her cure şahîkirin û şanazîkirinek bi Kurdbûna xwe, bo mînak hunermendek Kurd, werzişvanek Kurd, çalakvanek Kurd, akadimîsiyenek Kurd li Urmiye dibêje ez şanazim bi Kurd bûna xwe, vê yekê weke hewcehiyek bona daxwazîkirina hin armancên siyasî di nava Kurdên Urmiyê de dibînin, ber hindê evê weke gefek bo ser nasnameya xwe dizanin û hizir dikin şanazîkirina Kurdên Urmiyê bi Kurd bûna xwe, dikare bo wan gefek be.

Ya duyê basa kêbirkê ya riqabetek dîrokî ye, li destpêka Pehlewiya duyê yan bêjîn Mihemedrizayê Pehlewî

Dom » R:9

# Hevpeyvîna Agirî digel Rojnamevan Resûl Geleban



**Resûl Geleban**

**Hevpeyvînkar: Sîmîn Rûhanîzade**

**Doma » R:8**

piştî ku Pehilewiyê yekem li ser kar çû, û em bêjin piştî nemana Komara Kuridtanê, ku pêş vê jî Simkoyê Şikak şoreş kiribû, Kurd existine perawêzê de yanî Kurd neçarman, di nava bajar de nemînin û ber bi gund û çiyana ve biçin û bajar berdan, bi taybetî di Urmiyê de, û şinasa Azerî weke beşek ji şinasa Îranê xwe nûjen kir û carek din xwe berhem anî û bû şinasa sereke ya bajar, lewma di niha de xwe nûjenkirin û geşedana şinasa Kurdî di nava bajar de nek nava gundan de bo wan weke gefek tê hisabê, gef bi vê hisabê ku digel nûjen bûna şinasa Kurdî, Aezerî dê pêgeha xwe ya dîrokî ji dest bidin, û eva jî sedema dîrokî ya vê ye.

Ya din babeta mediya û torên civakî ye, bi taybetî di wan çend rojên derbasbûyî de rûpelên Panturikan bi taybetî li (X) de bizanebûn ev tiştên ku nebûn mezim kirin, weke mînak hatin belavkirin ku tîmên Kurdan bi gotina wan cudayîxwaz in, yan heman teciziyetelebin, lê di halekê de dana her dirûşmekê yan her kiriyarekê bixwe bi rewa dibînin, lê bo Kurdan ne, û bi rêya mediyayên xwe kiriyarên xwe weke serkevtin û cejinek dane xuya kirin, li aliyek din ve hewil dan ew tires di nava dilê Azeriyan de çêkin ku ger Kurdan serkevtin, şahî ya her tiştek din hebin eva bo me cihê tires ye, û di encam de ew hesta kerib û kîna şexisî zêde di nava Azeriyan de diafirandin, û her takek wan yên ku heta di berê de pêwendiyek baş bi Kurdan re hebûn piştî wan serkevtinan yan piştî Newroza mezin ya Urmiyê bi avayekî tund bertekên nerênî li hember Kurdan ji xwe nîşan dan.

**3. Sedema sereke ya wan hestiyariyane çiye û gelo destê rejîmê jî têda heye?**

**Bersiv -** Bê guman bi salane Komara Îslamî ya Îranê ew siyaseta balansa kontirol kirî di navbera êtinîkan de dişopîne û ew siyasete heye, yanî rê nade çi êtinîkekê çi miletekê ku di deverekê de bibe hêza sereke, taybet ev yeka li Ehwaz û wan deveran heye, lê ez bawerim li deverek weke Urmiyê de, eva ji destê hikûmetê derkeftiye yanî Azerî û Panturik bi kirasê şîegeriya xwe karîne hemû hêzê bixin bin destê xwe û ev hêza hewce, çi hêza serbazî be ya çi hêza siyasî be bigirine destê xwe û Kurdan bi sedemên cuda û bi pîlanên cuda tepeser bikin û tawanbar bikin, çi bi zîndanîkirinê, çi li ser sînoran wan bikuje û çi jî wan bidarvebike, eva bi bawera min li Urmiyê de ji destê hikûmetê jî derketiye, û di niha de hikûmetek local heye û ez ser vê bawerê me ku ev hikûmet li Tewrêzê pilan bo tê dariştin û Kurdan serkut dike, û ez ev pilanên ku li Tewrêzê tên darêtin, li cihên wekî damezirandina de, wekî dabeşkirina budcê de, wekî dabeşkirina şaristanan de dibînim û berçavin, û ger weke mînak em bas bikim li bakûrê parêzgeha Urmiyê ku zêdetir Azerî ne û ger çav li deverên Kurdî bikin weke Pîranşar û Serdeşit û Mehabadê gelek bi rohinî helawaridin yan cudatîdanîn di navbera Azerî û Kurdan de tê dîtin, lêwma netîce tê girtin ku hikûmeta navendî dest di wan reftaran de heye, û pîlan bona kuntirolkirina di navbera êtinîkan de heye, lê li Urmiyê ji destê hikûmeta navendî derketiye û niha destê Panturika deye.

**4. Bi nêrîna te rola civaka medenî ya Kurd û xelkê Urmiye bi giştî li hember wan reftarên ku tevdanî û alozîyan diafirînin, dibe çawa be?**

**Bersiv -** Civaka Kurdî li deh salên derbasbûyî de xwe çêkir, xwe hişiyar kir, lê piştî bi nav helbijardina meclisa 12 an ya rejîmê û çûna 2 nûnerên Kurd bo Mecilisê, û piştî Newroza îsal ku Newroz gelek bi başî û berfirehî li Urmiyê birêveçû, serkut li ser civaka Kurdî, çalakvanên Kurd zêde bû, û heta ku ez agadar bim zêdetir ji 30 kesan li Urmiyê ji aliyê navendên ewlehî we rastî dosiye saziyê hatine, yanî hatine gazîkirin, zîndanîkirin û neçar bi revîn û koçkirinê hatine kirin, ev tepeserî û serkute piştî Newroza derbasbûyî zêdetir bûye, lê dîsa jî di vî halî de em dizanin civaka Kurdî ku civakek e ku ber bi pêş diçe, û xwe agah û bihêz dike, mixabin piştî wan tepeseriyan hindekê lawaz bûye.

Herwisa bi mixabinî ve di niha de çalakvanên Kurd hatine matkirin. Weke mînak beşek ji wan çalakvanan ku amade bûn nirxê bidin di rêya berdewamiya çalakiyên xwe de, êdî niha xilas bûne û bê dengin, û di niha de hindek kes hatine meydanê ku asta çalakiyên medenî anîne xwarê û çalakî di bin alaya Îranê de birêve dibin û hin şiroveyên nû bo çalakiyên xwe darêtine, û ez li ser vê bawerê me ku hemû bi awayekî sîstimatîk ji aliyê Spaha Pasdaran û hêzên ewlehî ve hatiye organîzekirin. Lê bi vî halî jî ku rêya wan birêvebirina çalakiyan durist nîne, ez bawerim ku divê em rêbazek eqilanî bigirin pêşiya xwe bo birêvebirin û berdewamkirina çalakiyên xwe.
Da ez bi rohinî bêjim ka ew rê û rêbaz çiye ku divê em bidin pêşiya xwe, yek eva ye ku em divê diyalogên çandî di nava bajar de zêde bikin û ya din jî eve ku em bikarin bi duristî ji mediyayan mifahê wergirin.

Diyaloga ferhengî anku çandî bi wê wateyê ku çalakvanên Kurd û Azerî bikarin bigehine encamekê ku weke mînak encumenên hevpar yên jîngehî, çandî û perwerdehî bihevre ava bikin û kar bikin, yan jî li ser mijara zindîkrina gola Urmiyê bikarin bihevre çalakiyên bandordar bikin, evê jî bêjim ku Kurd amadeye vê yekê bike û bi salane vê peyamê dide, lê Azerî amade nîne, û ji ber vê yekê mixabin ev diyaloga ferhengî ser nagirît.

Ya din basa mediyayê ye, yanî mediyayên me yên Kurdî bi mixabinî ve ev jî hatine serkutkirin û nikarin weke ku hewce ye kar bikin, mediyayên me di navbera du tiştan de asê mane, yek eva ku dive di dema kar de bersiva daxwazkariyên civak û xelkê xwe bide û pêka hewcehiyên civakê kar bikin û ji aliyek din neçarin bersiva navendên ewlehî yên hikûmetê bidin ku yek û du jî nîne, pênc aliyên serek weke Wezareta Îtilat, Îtilata Spahê, Îtilata hêza Întizamî, Hiraseta Wezareta Erşad û Polîs Feta yê ye, û ji aliyê wa hemûyan ve tê serkutkirin û gef ji wan tê xwarin, lewma êdî çi karek ji dest wan jî nayê, ber vê yekê em nikarin gelek asta çavnihêriya xwe ji mediyayên navxweyî bibin serê, lewma nêrîna min eva ye ku mediyayên me tenê bikarin xweragir bin û xwe bihêz bikin heta ku roja wan tê eva gelek hewce ye.

**5. Kekê Resûl weke dawî gotina te li ser rewşa ku me baskirine çiye?**
**Bersiv -** Ez di dawî gotinên xwe de dibêjim ku Urmiye di niha de li rû de arame, bê denge, lê di bin de ger em bi hûrî mêze bikin, weke agirê bin xaliyê deye û dixumxume, û ew pirsgirêkên etinîkî û herwisa dabeşkirina nedadperwerane ya çawkaniyan û ew siyasetên ewlehî yên ku dixwazin balansekê çêkin ku li Urmiyê de nekariye û hêz ketiye destê Panturikan de, eva heman agirê bin xaliyê ye, û eger em lipey vê yekê bin ku ev agire hêzek yan aliyek siyasî xweş neke û gurr neke, em neçarin ku gotar û diyalogek hevpar û beraber di navbera xwe de çêkin, ku şerê nasnameyî û şinasî têde nebe, ez carek din li ser vê yekê tekezî dikim ku Kurd ti carî lipey şerê şinasê nîne û eva yek ji ciyawaziya me Kurdan digel Azeriyan e li Urmiyê de, yanî ciyawaziya me eva ye ku Azerî ti neteweyek din qebûl nake, lê Kurd dibêje ez heme û her êtinîk û neteweyek din hebe li Kurdistanê de wan jî maf heye weke min, lewma ev gotara hevpar ku me bas jê kir bi sedema ev cudahiya hizir û nêrîna Kurd û Azeriyan sernagirît, lê ev yek bi rastî hewceye û em mehkûmin bi vê gotarê mehkûmin bi bihevre jiyanê.

# Salvegera wefata Seyda Cegerxwîn (1984-1903)



Yûsif Kaynak



Helbestvanê mezin ê Kurd Cegerxwîn 41 sal berê koça dawî kir. Kurdên li çaraliyê cîhanê her sal di 22ê Cotmehê de ji bo Cegerxwîn bîranînan li dar dixin. Mezinahiya wî her ku diçe bêtir tê famkirin, û pirtûkên wî îro jî di nav ciwanan de, mîna duh, digeriyan û ji bo helbestvan û hunermendan wekî çavkaniyek îlhamê xizmet dikin.

Min li jêr helbestek ji xebateke ku min di salên hezar nehsed nodî de kiriye, wekî bîranîneke bi êş a mayîna wî ya di girtîgehê de nivîsandiye pêşkeşî we xwîner dikim.

Cegerxwîn jiyana xwe a siyasî û edebî jî di rewşeke pir dijwar û nebaş de borandiye. Li Iraqê cara yekemîn hatiye dîl kirin, xistin girtîgeha navdar “Neqretis-Sileyman”. Piştî ku vegeriya Sûriyeyê vê carê ji aliyê Sûriyeyê ve hatiye girtin û ew sî û sê rojan avêtine hepisxaneya “Mez-ze”.

Dû derketinê ji wê hepsê li ser van sî û sê rojan helbesta xwe ya bi navê: “Sih û sê roj di zindanê de” nivîsandiye: Cegerxwîn bi tevayî deh caran hatiye girtin; carekê jî sirgûn bûye û carekê jî bo şeş mehan li mal di bin hepsa çavdêrî de maye.

Çend caran jî ji ber zordariya rejîma Sûriyeyê reviyaye çûye Lubnanê û li wê bi nehênî/bi veşartî demekê maye.

Di navbeyna 1964an û 1966’an de bi jêhatî û zîrekîya xwe xebat kiriye: li gel helbest nivîsîne mijûlî nivîsandin û tasnîf kirina tarîxa Kurdî û Kurdistanê û berhevkirina folklora Kurdî bû û hinek jî pirtûkên tarîxî yên ji zimanê erebî werdigerandin zimanê Kurdî (Kurmancî). Li gel van çalakiyên hunerî xebata xwe ya siyasî jî her daîm ji alî de domandiye.

**Çend gotinê bi gelemperî li ser hunera Cegerxwîn**

Min di karê xwe de Cegerxwin wekî şaîre netewî yê sedsala 20mîn binavkiribû di wêje Kurmancî de. Soranî ji Kurmancî pêşketitir e, ji ber ku li ser nivîsandina Soranî qedexeyek nîne. Mijara min Cegerxwîn û wêjeya bi Kurmancî biserdejî helbestvanekî Kurmanc bû.

Di dest me de ji çendek heb dîwane wî zêdetir malzeme nebû pirsê pê re rû bi rû dibûm her zêde bûn. Kesî nivîsareke zanistî nenivisîye, kê çi nivisîye bi îdeolojî û dirûşme sîyasî dagirtîye û çendek sloxane şoreşgerîyê wê demê ne.

Min nedikarî herdem ji şoreşgerî û sosyalîstîya Cegerxwîn behskira, loma min Cegerxwîn kir qonaxên cude cude ku belkî ji raya gîştî re û ji xwendewaran re hineke rave bikim ku mîrov Cegerxwîn jî wekî me bi dewr û demê re bîrûbawerîye xwe guherîne û guhertîye û pêşketîye û gêş bûye.

Cegerxwîn di destpêka de bi helbestên xwe kevnar e di şêwaza tradîsyona Ahmedê Xanî û Melê Cizirî de ye, ne oldarekî hişk e, belê him bi form him naverokê xwe girêdayê ekolê dîwan edebîyatî a bi arûz e. Bi qafîye û beyt e. Mijar dîsa ji welatperwerî û nîştîmanperwerî dagirtibûn, ew ji dest pêke de berçavan e. Ewqasî li gundan meletî dike jî ji erdnîgerîya welêt ya xemilandî hîç wexteke dûrneketiye, mijar e xwe her gelê Kurd û klasîkê Kurdî yê wek Mem û Zîn û Memê Alan her mîjarê wî ne.

Ji aliyê têmatikî ve min kifş kir ku Cegerxwîn helbestvanekî lîrîk û dîdaktîk e û bi şikla formî klasîk e. Ji aliyê estetîkî ve jî Cegerxwîn di maneya bêjeyên nûjen yên kontrast û obje de ne nûjen e.

Lê di estetîka marksîzm û lenînîzmê de sosyal realîst dikare were pejirandin. Wekî her helbestvanekî yan hunermendekî di berhemên xwe de hestên sosyalî yanê mijare civakî tîne zimên.

Tecrubeya estetîkî wek navgînek e ku jiyanê bi lezkirinî bide jiyandin û ji bo ku vê rastiyê/realîteyê çêtir binasî aniyê ziman, lê ew jî li gor wî ne her demê de mimkun e ku bi rasteqînî bi wan bêjeyan hema bînî zimên.

Çend şîroveyê dawî ji bo nifşe nû lê zêde bikin: Cegerxwîn her çiqas ji bo Kurdên Kurmancîaxêver helbestvanekî neteweyî yê girîng e jî, lê hetanî niha girîngiya wî ji aliyê Kurdan ve bi têra xwe nehatiye fêm kirin û ne bûye mijara lêkolînên zêde. Nifşê ciwan, tevî hemî çavkaniyên xwe, dikarin Cegerxwîn wekî mijara tezên xwe yên dibistanê lêkolîn bikin.

Mînakî, pîvanên ku Cegerxwîn di helbestên xwe de bikar tîne: Di wêjeya me de sê celeb pîvan têne bikar anîn: heceyî, aruz û azad!.

Her pîvan ji avahiya zimanê ku ew jê re girêdayî ye derdikeve holê. Pîvana Aruz, an jî pîvana arûz (Osmanî: vezn-i arûz), sîstemek helbestan e ku di wêjeya Erebî de derketiye holê û belavî wêjeya Îslamî bûye. Ew li ser prensîba hejmareke wekhev ya heceyan di rêzan de ye.

Rêzên mayî yên di helbestê de divê heman hejmara hece’yan wekî rêza yekem di pîvana heceyî de hebin… Şêweyên/ Formên beytê/helbeste li ser 12 (dozdeh) cureyan têne dabeşkirin, bi navên Gazel, Rubai, Kaside/ Qasîde, Tuyuğ, Mesnewî, Murabba, Kıta, Şarkı, Müstezat, Terkibîbent, Terciî-bent, Musammat. Li gorî mijaran jî şeş cureyê helbestê hene: lîrîk, epîk, dîdaktîk, şivanî, mîzahî û dramatîk tên navkirin.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Rêjîma Îranê 28 girtiyên din li girtîgehên xwe de bidar vekirin

Navenda Mafê Mirovî li Îranê bi belavkirina amarekê daye zanîn ku li wan çend rojên derbasbûyî de rêjîmê 28 girtiyên din li girtîgehên xwe li seranserê Îranê, bidar vekirine û bi wî awayî amarên tomarkirî ya bidarvekirina girtiyan li girtîgehên rêjîmê ji destpêka heyva Rezberê ve heta 30ê vê heyvê, zêdetir ji 280 halet bûye ku bi awayek nêvincî, rêjîmê li her 3 demjimêran de girtiyek bidar vekiriye.

Pêka wan amaran, rêjîmê 28 girtî ji 26 heta 30ê heyva Rezberê li girtîgehên xwe li bajarên “Bîrcend, Şîraz, Îsfehan, Kirmaşan, Taybad, Yezd, Têhran, Zencan, Kerec, Gurgan û Qum”ê de bidar vekirine.

Rêjeya bidarvekirinên li vê heyvê bi qasekê zêde ye ku piştî bidarvekirinê bikom li sala 1367 a Rojî, xwînbartirîn heyv bo girtiyan bûye.




## Hêzên hov ên rêjîmê malbatek kirine armanc û zarokek wan kuştin

Demjimêrên şeva 18ê Çiriya Pêşîn, hêzên hov ên wêzgeheke nû ya lêkolînê li nêzî gundê “Bît Kuwar”ê ser bi devera Howêyzê, bê agehdarkirina berê û xoserane û bi awayê rasterast teqe li maşîna hevwelatiyekî Ereb ê bi navê “Nebî Şerîfî” kirin ku li encamê de zarokek bi navê “Zulfeqar Şerîfî, kurê Nebî hatiye kuştin û bira, dayîka û bavê wî zarokî bi dijwarî birîndar bûne.

Pêka raporên belavbûyî maşîna vê malbatê ku mijûlê derbasbûn ji vê wêzgeha nû ya lêkolînê bûye, wan hêzên hov bê ti agehdarkirinek ku bisekine, maşîna wan dane ber desrêja gulleyan.

Tevî ku berpirsê hêza tepeserker a întizamî ya Hovêyzê ragihandiye ku dosyeyek bo tawanbarên vê teqeyê hatiye çêkirin, lê çavkaniyeke nêzî malbata Şerîfî ragihandiye ku heta niha ti bikerekî vê cinayetê nehatiye binçavkirin û rêjîmê gef li wan kiriye ku xwe ji hevpeyvîn digel ragihandinan biparêzin neku dê wan siza bikin.



## Rêjîma Îranê 20 sal girtîgeh bi ser 8 çalakvanên xelkê parêzgeha Kirmaşanê de sepand

Pêka rapora “Çaw News”ê, 8 welatiyên Kurd ên bi navên “Yasîn Eizemî, Moîn Xudadadî, Yasîn Şehsewar, Ferîd Muradî, Yasîn Remezanîzade” yên xelkê bajarê Ciwanroyê û “Hêmin Palanî, Îrfan Muradî û Pêyman Babayî” yên xelkê Serpila Zehawê, bi tohmeta “endametî li girûpên dijber” ên rêjîmê, ji aliyê taya 1 a dadgeha inqilab a rêjîmê li bajarê Kirmaşanê ve her yek 2 sal û 6 heyv girtîgeh bi ser de hatine sepandin û piştî nerizayetînîşandana wan li derheq vê sizaya sepandî, ji aliyê taya 14 a dadgeha pêdeçonê, ev siza hatiye erêkirin.

Ev çalakvanên olî li sala 1400 a rojî de hatibûne binçavkirin û piştî 2 heyvan bi danîna barimtê, bi awayê demkî hatibûne serbetkirin û li vê dawiyê bo cîbicîkirina sizaya sepandî hatine gazîkirin.



# Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (504)